# Xalîd Begê Ehmed Paşayê Baban di Arşîvên Osmanî da


## Kurte

Dîroka kesayetî û mîrên mîrektiya kurdan bi taybetî jî mîrên Babaniyan hîn jî ne pir zelal e. Nexasma piştî hilweşîna mîrektiyê, hin ji mîr û kesayetiyên Babanê ber bi bajar û herêmên din ên Osmanî ve hatin koçberkirin û hin ji wan di dewleta Osmanî de meqamên bilind wergirtin. Eger çî ji ber bûyerên hilweşîna mîrektiyan di sedsala 19an de û ew axa pir pirsgirêk ku ketibû ser rêya dewleta Îranê, ew arşîvên wan malbatan piranî wenda bûn. Lewma peydakirina her agahiyekî derbarê wan kesayetiyan ji bo dîroka wan mîrektiyan pir girîng e. Yek ji van kesan, kurê Ehmed Paşayê Baban, Xelîl Xalid Beg (1840-1902) bû. Ew karbidestekî Dewleta Osmanî û rêveberekî serkeftî bû. Ev gotar li ser jiyan û hewlên wî di warê rêveberiyê de, bi taybetî di bin ronahiya belgeyên Osmanî de, disekine ku ji bo cara ewil tên kifiş kirin û têda gelek qonaxên jiyana wî û sala jidayikbûn, mirin, kar û çalakiyên wî dixe ber behs û lêkolînê. Her wisa bi rêya pirtûkek taybet ku bi zimanê Erebî li ser wî hatiye nivîsandin û cara ewil e ev pirtûk tê peyda kirin, ew rol û navûdengê wî di cîhana Erebî de bi giştî û bi taybetî jî li wîlayeta Beyrûtê ronî dike. Digel wê çendê jî çend heb nimûne ji wan helbestên ku derheqa pesnê wî de bi zimanê erebî hatine honandin nîşan dide. Ew aliyên ku ev gotar li ser sekiniye û ew agahiyên nû dikarin bibin beşek ji kifşkirina jiyana mîrên Baban û malbatên wan di gel wê çendê jî dîroka îdarîya dewleta Osmanî û kesayetiyên kurd di wê çaxê de zengîntir dikir.


**Peyvên Sereke**: Xelîl Xalid Beg, Mîrên Baban, Belgeyên Osmanî, Beyrût, Silêmanî

# Osmanlı Arşivlerinde Babanzade Ahmed Paşa’nın Oğlu Halid Beg


## Özet

Kürt beyliklerinin şahsiyetleri ve beylerinin, özellikle de Baban hanedanının beylerinin tarihi hâlâ çok net değildir. Özellikle beyliğin çöküşünden sonra, Baban beylerinden ve şahsiyetlerinden bazıları diğer Osmanlı şehir ve bölgelerine nakledildi ve bunlardan bazıları Osmanlı devletinde yüksek mevkiler elde etti. 19. yüzyılda beyliklerin çöküş olayları ve İran devletinin yoluna düşen çok sorunlu durum nedeniyle, o ailelerin arşivleri çoğunlukla kaybolmuş olsa da, bu şahsiyetler hakkında herhangi bir bilgi bulmak o beyliklerin tarihi için çok önemlidir. Bu kişilerden biri Ahmed Paşa Baban’ın oğlu Halil Halid Bey (1840-1902) idi. O bir Osmanlı memuru ve başarılı bir yöneticiydi. Bu makale, onun hayatı ve yöneticilik alanındaki çabalarına, özellikle ilk kez incelenen Osmanlı belgeleri ışığında; doğum yılı, ölümü, işi ve faaliyetleri dahil olmak üzere hayatının birçok aşamasını tartışmakta ve araştırmaktadır. Aynı şekilde, hakkında Arapça yazılmış ve ilk kez keşfedilen özel bir kitap aracılığıyla, genel olarak Arap dünyasındaki ve özellikle Beyrut vilayetindeki rolünü ve ününü aydınlatmaktadır. Bununla birlikte, onun övgüsünde Arapça bestelenmiş şiirlerden birkaç örnek de göster-


BUYDED
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2025 • Cilt/Volume: 11 • Sayı/Issue: 21

**Hemin Omar Ahmad**
heminahmad40@gmail.com
Orcid: 0000-0003-1985-9512
Mastir, Zanîngeha Bîngolê, Beşa Tarîxê

**Makale Türü** /**Article Type:**
Araştırma Makalesi / Research Article
**Makale Geliş Tarihi** / **Received:** 30.04.2025
**Makale Kabul Tarihi** / **Accepted:** 11.06.2025
**Makale Yayın Tarihi** / **Published:** 29.06.2025
**DOI**: 10.56491/buydd.1687258

mektedir. Bu makalenin odaklandığı yönler ve bu yeni bilgiler, Baban beylerinin ve ailelerinin hayatlarını keşfetmenin bir parçası olabilirken, aynı zamanda o dönemin Osmanlı yönetimi ve Kürt şahsiyetlerinin tarihini de zenginleştirmektedir.

**Anahtar Kelimeler**: Halil Halid Beg, Baban, Osmanlı Belgeleri, Beyrut, Süleymaniye

## Khalid Beg Son of Ahmad Pasha of Baban in the Ottoman Archives

### Abstract

The history of the personalities and princes of Kurdish principalities, particularly the princes of the Babani dynasty, is still not very clear. Especially after the collapse of the principality, some of the Baban princes and personalities were relocated to other Ottoman cities and regions, and some of them attained high positions in the Ottoman state. Although due to the events of the collapse of the principalities in the 19th century and the very problematic situation that had befallen the Iranian state's path, the archives of those families were mostly lost. Therefore, finding any information about those personalities is very important for the history of those principalities. One of these people was Khalil Khalid Beg (1840-1902), son of Ahmed Pasha Baban. He was an Ottoman official and a successful administrator. This article focuses on his life and efforts in administration, particularly in light of Ottoman documents that are being examined for the first time, and discusses and investigates many phases of his life including his birth year, death, work and activities. Likewise, through a special book written about him in Arabic that is being discovered for the first time, it illuminates his role and reputation in the Arab world in general and particularly in the Beirut province. Nevertheless, it also shows several examples of those poems that were composed in Arabic in praise of him. The aspects that this article focuses on and this new information can become part of exploring the lives of Baban princes and their families, while also enriching the history of Ottoman administration and Kurdish personalities of that time.

**Keywords**: Khalil Khalid Beg, Baban, Ottoman Documents, Beirut, Sulaymaniyah

## DESTPÊK

Malbata Baban, ku eslê wê bo Feqî Ehmedî Dareşmane (1610-1663) vedigere, nêzîkî dused salan li Silêmaniyê û derdora wê desthilatdarî kiriye, tevî ku herêma Silêmaniyê û Mîrektiya Baban ji aliyê cografî ve li cihekî stratejîk û li ser sînorê Îranê bûn. Ji ber vê yekê herêm ji aliyekî ve her tim bi Îranê re, li aliyê din bi Kerkûk û Bexdayê û ji aliyê kurdan ve jî bi mîrektiya Soran re sînordar bû. Ev gelek caran ji wan re dibû sedema pirsgirêkan. Dîroka dused salên Mîrektiya Baban û jiyana mîrên wan, hinek bi rêya rojhilatnas û gerokan û hinek jî bi rêya dîroka devkî ve hatiye nivîsandin lê hêj gelek aliyê wan tarî ye.

Arşîvên Osmanî xezîneyeke mezin e ku li ser bûyerên mîrektiya Baban û dîroka jiyana hin mîrên wan agahiyên giring dide, nemaze piştî ku Ehmed Paşayê Baban (?-1875) di sala 1847an de ji mîrektiya Baban hat derxistin û sirgûnî Stenbolê hat kirin. Êdî piştî çend salan bi dewleta Osmanî re li hev kir, zarokên wî li Stenbolê dest bi xwendinê kirin û bûn karbidestê payebilind ê Împeratoriya Osmanî. Yek ji zarokên vî mîrê Baban; Xelîl Xalid Beg e ku li ser şopa bavê xwe çû, bû karbidestekê dewletê. Derbarê kesayeta wî her çendî kêm agahî hebin jî, di arşîvên Osmaniyan de cara yekem li ser jiyan û çalakiyên wî agahiyên nû hatin dîtin. Ev gotar li ser qonaxên jiyana navborî di bin ronahiya çend belgeyên osmanî de radiweste, lê di heman demê de ev gotar pirtûkeke erebî li ser Xalid Begê ku di dawiya sedsala nozdehan de hatiye çapkirin, kifş dike ku komeke pesnên xelkê Beyrûtê ne derheqê camêrî û qenciya Xalîd begê.

Herçend nebûna jêderên zêdetir kêşeya vê gotarê bû, lê destnîşankirina sala jidayikbûn, mirin û qonaxên xebatê wî û ronîkirina qonaxa walîbûna wî li Beyrûtê ji aliyê çavkaniyeke erebî ve, giringiya ev kesayetiya Baban nîşan dide, Lewma ev gotar destpêkek baş e ji bo zanîna jiyana mîrên Baban, zarok û malbatên wan û çawaniya jiyana wan piştî hilweşîna mîrektiya wan, ku ev hemû beşek ji dîroka malbatê vedibêjin.

## 1.Derbarê Zarokên Ehmed Paşayê Baban

Piştî wendabûna malbata mîrên Baban û derxistina herdu bira Abdullah Paşa û Ehmed Paşa ji bo nêzîkî paytexta Osmanî, zarokên Ehmed Paşa çend salan li Bexdayê dimînin. Piştî ku Ehmed Paşa di destpêka nîvê duyemîn ê sedsala XIXan de li Stenbolê bi cih dibe, di 18ê meha Muherrema sala 1268an a hicrî 13.01.1851an de nameyekê ji selteneta Osmanî re dinivîse û daxwaz dike ku îzin bidin sê kurên wî ji Bexdayê ber Stenbolê ve werin û ji wan xwest ku li mekteba leşkerî bixwînin û ji nû ve bibin leşkerê dewleta Osmanî ku ev hêviya wî ya demdirêj bûye **(A.}MKT.NZD.00046.00001.001)** . Li gor belgeyên osmanî Xelîl Xalid Beg, Mehmûd Nadîm Beg û Emîna Xanim wek zarokên Ehmed Paşa tên binavkirin.

## 2.Jînenîgarîya Xalid Beg di Qeyda Karmendên Dewleta Osmanî de

Ji ber ku piraniya karmendên dewleta Osmanî dunavî bûn, Xalid Beg jî ku di destpêkê de navê wî Xelîl Xalid bû û di nav karmendên dewleta Osmanî de wiha dihate wesifandin: Xelîl Xalid Beg kurê Ehmed Paşa yê rehmetî û waliyê berê yê Adanayê bû. Ew di sala 1256ê Hicrî (1840ê Mîladî) de li Silêmanîyê ku grêdayê wîlayeta Bexdayê ye ji dayik bûye. Pêşî li Dibistana Ruşdiye û dû re jî li Dibistana Harbiyê xwendiye. Ew zimanên tirkî, erebî, farisî û fransî bi xwendin û nivîsîn zaniye, her wiha şarezayê kurdî, îngilîzî û elmanî jî bûye.

Di 21 saliya xwe de, di sala 1277an de li Dibistana Seretayî ya Harbiyê bû mamosteyê erdnîgarî, kozmografî û dîrokê. Paşê li Dibistana Ruşdiye bû mamosteyê matematîkê. Du sal piştra rutbeya Yuzbaşîtiyê li Erzurumê bidest xistiye. Sala 1286an karê xwe guhrandiye û li Babê Alî di oda wergêranê û bi me'aşeke 200 quruşî hatiye damezrandin. Paşê li Darul-Funun bi mûçeyekî 800 dirhemî bû mamosteyê erdnîgariyê. Di sala 1887an de, ew li Balyozxaneya Londonê bi mûçeyek 2,000 qurûşan bû nivîskarê duyemîn. Piştî du salan rutbeya wî hate bilind kirin, ew bi mûçeyek 3,000 quruşî bû Serkatib li Balyozxaneya Parîsê. Piştî du sal û nîvan ji karê xwe hat dûrxistin.

Di 21ê Rebî'ul Ewwela sala 1286ê Hicrî (22.7.1869) de bi mûçeyekî 7,500 quruşan wekî komîserê duyemîn li Manastrê hat tayînkirin. Ew pênc mehan li wir ma û dû re mûçeya wî zêde bû û gihîşt 10,000 quruşan. Piştî guhertina navnîşana xwe û şeş meh şûnda, mûçeya wî gihîşt 15,000 quruşan û ew li balyozxaneya Belgradê hate xebitandin.

Di 7ê Rebî'ul Ewwela sala 1303 (14.12.1885) an de, Qiralê Sirbistanê diyariya yekem da wî. (Ew nikarîbû xwe li bajarên ku lê hatibû tayînkirin biguncîne, ji ber ku qels û nexweş bû, û xwest ku bi awayekî daîmî were tayînkirin. Ji ber vê sedemê, wekî li deverên din, wî nikarîbû erkên xwe yên wekî balyoziya Osmanî li Belgradê bicîh bîne.) Ew gelek caran destûr digirt û carinan jî bê destûr ji Belgradê derdiket, ku vê yekê hikûmeta Osmanî aciz dikir.

Ji aliyekî din ve, misilmanên herêmê ji performansa Xelîl Xalid Beg nerazî bûn û li dijî wî xwepêşandan li dar xistin, heta wî bi piştgiriya polîtîkayên hikûmeta Sirbîstanê yên li dijî misilmanan tawanbar kirin û ji ber vê yekê bang li hikûmeta Osmanî kirin ku wî ji kar dûr bixe. Her çend dewleta Osmanî hewl da ku bi vekirina ofîsekê li Belgradê pirsgirêkên Misilmanan ji nêz ve bişopîne û çareser bike jî, berteka Misilmanan a li hember Xelîl Xalid Beg rewş aram nekir û di dawiyê de bû sedema ji kar dûrxistina wî di sala 1885an de **(Temizer ve Serbestoğlu, 2019: 285-289).**

Ew di 23.12.1302 (03.10.1885)an de li Balyozxaneya Tehranê bi mûçeyekî 20,000 quruşî hate wezîfedarkirin. Di 19.01.1303 a mişextî de wî pileya duyemîn a Mecîd wergirt. Di 10ê Receba 1303ê Hicrî (14.04.1886)an de, ji layê dewleta Îranê de xelata Şûr û Rojê wergirt.

Her wiha di 18ê Şebana 1304ê Hicrî de ji aliyê hezretê şahenşahê Împeratorê Îranê ve Merse Timsalî jê re hatiye pêşkêşkirin. Di 5ê Remezana 1307an a Hicrî de, ji aliyê dewleta Îranê ve bi pileya yekem û lewha Şûr û Rojê hat xelatkirin. Di 29ê Rebî'ul Ewwela 1309ê Hicrî (02.11.1891)ê de ew bi mûçeyek 17,000 quruşî bo wîlayeta Adanayê hate veguhastin.

Di 3ê Şe'bana 1309ê Hicrî de îstifa kir û di 5ê meha 12ê heman salê (01.07.1892) de bi mûçeyekî 20,000 quruşê li Beyrûtê hate tayinkirin. Di 16ê Sefera 1312ê Hicrî de, ew bo wîlayeta Kastemoniyê hate veguhastin. Di meha rebî'ê duyemînê ya heman salê de, mûçeya wî zêde bû û gihîşt 20,000 quruşan. Di 4ê Rebî'ul Ewwela

sala 1313an (24.09.1895) de yekem pileya Stanislas ji aliyê dewleta Rûsyayê ve wergirt. Wî ji ber nexweşiyê serlêdana destûra çûna Awropayê kir, ji ber vê yekê li Kayseriyê jiya û di 26ê Kanûna Pêşîn a heman salê de serlêdana teqawidbûnê kir **(DH.SAİDd..00002).**

## 3.Teqawîtbûna Wî

Li gorî belgeyeke bi dîroka 09.04.1317 a Hicrî (17.08.1899)an de, Xalid Beg, waliyê Kastemoniyê, ji karê xwe îstifa kiriye û niha li Kayseriyê dijî û dixwaze teqawid bibe. Ew herî kêm 30 sal xizmet kiriye û mûçeya wî ya mehane 3,000 quruş e. (MV.00098-2) Li gorî belgeyeke din, biryara îstifaya Xalid Beg ji waliyê Kastemoniyê ve hatiye pejirandin **(DH.ŞFR.00178.00034.001).**

Di belgeyeke bi dîroka 19.08.1319an a mişextî de, behsa lîsteya karmend, mûçe û pileyan tê kirin. Ew di 12ê Adara 1277an (24.03.1861) de hat tayînkirin û 31 sal û 11 mehan wek karmendê dewletê xizmet kir. Li London, Parîs, Bexda, Tehran, Beyrût û Kastamonuyê xebitiye **(ŞD.00096.00034.001).**

## 4.Hevjîna Wî

Derbarê jina Xalid Begê de, belgeyek wê wekî Suheyla Xanim bi nav dike. Lêbelê, di belgeyeke din a bi dîroka 26.12.1319 Hicrî de, tê gotin ku Xalid Begê rehmetî, waliyê wîlayeta Kastamoniyê, teqawidiya xwe ji gencîneya teqawidiyê ya bajêr ji bo jina xwe Ayşeyê terxan kiriye **(ŞD.01002.00064.002).** Em nizanin ku kîjan durust e û kîjan şaş e. Çunku divê yek ji wan bi xeletî hatibe nivîsandin.

## 5.Mirina Wî

Piştî lêgerîna di nav belgeyên Osmanî yên derbarê mirina Xalid Beg de, me pêşî dît ku belgeyek behsa mirina wî dike, bêyî ku bi zelalî behsa tarîxê bike. Li gorî belgeyeke Osmanî ya bi dîroka 29.12.1319 Hicrî, nameyeke xezîneyê ya ku amaje bi wê çendê dike ku merhûm Xalid Beg her mehek maaşê wî 1790 quruşî bûye û piştî mirina wî ev mûçe dê ji mîratgirên wî re were dayîn **(Y..PRK.ML.00022.00083.001).**

Lêbelê, belgeyeke din tarîx, bi roj û meh û sal a mirina wî wekî 26ê Kanûna Pêşîn a 1317 a Rumî (08.01.1902) dide û wî wekî waliyê berê yê Kastemonî û kurê rehmetî Ehmed Paşa waliyê Edeneyê dide nasîn. Li gorî şer'a Xwedê, ku mûçeya rehmetî 1342 quruş bû. 1342 quruş ji bo birayê wî Mustafa Îzzet Beg û ji bo jina wî Suheyla Xanum jî 447 quruş. Eve jî li ser daxwaza birayê wî Mustafa Îzzet hatin zêdekirin.

Ev mûçe ji roja mirinê ve tê hesabkirin û ji hêla mîratgiran ve tê wergirtin. Ev belge di 18.05.1327 a mişextiyê de hatiye nivîsandin. **(BEO.003568.267531.002)**

## 6.Xalid Beg û Walîbûna wî li Beyrûtê

Wekî ku li jor hate gotin, Xelîl Xalid Beg di 05.12.1309 Hicrî (01.07.1892)an de bi mûçeyek 20,000 quruş û pileyeke bilind li wîlayeta Beyrûtê hate tayinkirin. Wisa xuya dike ku di demek ewqas kurt de ji aliyê gelê Lubnanê ve hatiye hezkirin. Îstifaya wî ji aliyê rojnameyên herêmî ve hatiye behskirin û hemû ew pesinandin û helbestên ku ji bo wî honandibûn di sala 1894an de li Beyrûtê di du cildan de hatin weşandin. Pirtûka 90 rûpelî, merasîma ku ji bo rêzgirtina Xelîl Xalid Beg hatiye lidarxistin vedibêje. Naveroka wê paragrafên jêrîn dihewîne (**Cerîdeya Lisanul-hal, 1894**): Naveroka karta vexwendinê ya merasîmê bi zimanên tirkî û erebî ye û dibêje ku divê ofîsên hikûmetê êvara Yekşemê 2yê Kanûna Duyema sala 1309an amade bin.

Li gorî rojnameya Hedîqetu'l Exbar, hejmar 1835, di roja 05.01.1894an de bi boneya giringîdayina Hezretî Xalid Beg Efendî bi waliyê Beyrûtê, Mihemed Efendî Şaredarê Beyrûtê û endaman, ji bo wî daweteka şîvê li dar xistin.

Bi heman awayî, rojnameya El-Misbah di hejmara xwe ya 1031an de ev daxuyanî weşand. Rojnameya Beyrûtê di hejmara xwe ya 619an de behsa xizmetên Xalid Beg kir û spasiya xwe anî ziman.

Rojnameya Lîsanu'l Hal (لسان الحال) di hejmara xwe ya 1578an de, behsa şîvê kir û got ku naveroka merasîmê dê di hejmara bê de were nîqaşkirin. Di hejmara bê de, wan raporek berfireh li ser merasîmê weşand, ku ligel

axaftina şaredarê Beyrûtê, digot ku Naum Paşa, waliyê Cebelê Libnanê, endamên encumena wîlayetê û berpirsên payebilind ên leşkerî û hikûmetê amade bûn.

Birêz Walî gotarek bi Tirkî xwend û spasiya encumenê şaredariyê û şaredarê wê ji bo hewldanên wan kir. Di heman merasîmê de Sahibu'l Fezile Şêx Ebdulrehman Efendî El-Nehas neqîbê Sedatê Eşraf helbestek xwend. Paşê îzzetlu Hesen Efendî gotarek xwend ku tê de spasiya walî kir û bal kişand ser hewildan û têkoşîna wî.

Merasîma ku li seraya dewletê hat lidarxistin, bi beşdariya girseyeke mezin pêk hat û heta derengiya şevê dewam kir. Hol û baxçe bi çirayên cûrbecûr hatibûn xemilandin. Agir û ronahî ji stûnan bilind dibûn û dîmenek pir xweşik û balkêş didan erdê. Li ser deriyan hatibû nivîsîn: Padişahım çok yaşa.

Di dawiya merasîmê de, rojnameyê hewl da ku hemû gotar, helbest û helbestên ku di rojnameyê de werin weşandin bi dest bixe, lê hemû peyda nebûn. Şahî li dora nîvê şevê bi dawî bû.

İzzetlu Hesen Efendî gotarek pêşkêş kir, ku bi helbestek pesnê walî dest pê kir ku amaje bi wê çendê da Xalîd bi tenê serê xwe di nav qinciyê û fedlê de têr û tijî bûye[1]:

يا خالد العزم يا والى الولاية يا      فردا تكملت فى فضل واحسان

وكيف لا تكمل الذات التى رفعت      لها بنود العلى من عهد بابان

Rojnameya (Semeratu'l Funun) di hejmara 963 ya 8ê Receb 1311 (15.01.1894)an de gotarek bi sernavê (Mihrecanu'l Ems ew elî'tîraf bi'lCemîl / Şahîya dûh an îtîrafkirina bi xweşikiyê) weşand, ku tê de nîqaş kir ka em çawa dikarin hest û kêfxweşiya ku mirov duh êvarê anîne ziman, îfade bikin?

Di axaftina xwe ya retorîkî de, Walî pêşî spasiya Xelîfe kir ji bo rola wî di ji nû ve avakirina welêt de, dû re bal kişand ser pêşketina Beyrûtê di warê geşbûnê de, lê di heman demê de behsa reforman û erkê şaredariyê kir ku mafên welatiyan biparêze. Piştre, helbestvan, nivîskar û axaftvanan merasîm bi nivîs û axaftinên xwe yên bi pesnê hezretî Walî xemilandin.

Rojnameya Beyrûtê di hejmara xwe ya 620an a roja 8ê Recebê, 1311ê Hicrî de raporek weşand û got ku encumenê şaredariyê, ku zimanê bajêr e, hestên xelkê bajêr ji bo walî û karên wî yên baş li wîlayetê hildigire.

Rojnameya El-Ehwal (الأحوال) ragihand ku merasîmê li ser sê xalan sekinî: ya yekem spasî û pesindan ji bo Xelîfe û dua ji bo temendirêjiya wî, ya duyem spasî ji bo Wali Xalid Beg Efendî ku bi polîtîkayên baş di pêşkeftina bajêr de rolek lîstiye. Piraniya axaftinan tekez kirin ku sirra serkeftina Xalid Beg ew bû ku ew ji malbateke wezîrên navdar ên Baban bû. Ya sêyem li ser hewldanên Şaredar Mihemed Efendî ye.

Rojnameya Hedîqetu'l Exbar (حديقة الأخبار) jî di hejmara xwe ya 1837an de raporek berfireh li ser merasîmê weşand.

Rojnameya El-Misbah(المصباح) di hejmara xwe ya 1033an de destnîşan kir ku spasdarî ji bo kirinên baş pêwîst e û ji ber vê yekê hemû xelkê Beyrûtê dê kirinên baş ên zilamê mezin ê Împeratoriya Osmanî, Xalid Beg Efendî, waliyê wîlayetê, ji bîr nekin. Ji ber vê yekê dema ku bûye walî, Wî dudilî nekiriye ku bi her awayî xizmeta bajar, xelkê wê û berjewendiyên wê bike. Paşê birêz Wali Xalid Beg gotarek bi zimanê Tirkî xwend ku kêm kesan gotarek wisa tijî ji belaxet û xweşrewanî bihîstibû.

Rojnameya fermî El-Wilayat di hejmara xwe ya 256an de got; Gavên reformê yên ku hezretî Walî Xalid Beg Efendî ji dema ku dest bi kar kiriye ve avêtine, bi her awayî bandor li ser wan kiriye, Ji van karan hinek ev in: avakirina Bingeha Gazan, firehkirina rêyan û hêsankirina karûbarên welatiyan.

Hesen Efendî di axaftina xwe ya bi zimanê Erebî de pesnê Xalid Begê Baban dide. Piştre ew qala kirinên xwe yên baş di vekirina rê, piran, avahiyên xêrxwaziyê û balkişandina ser tenduristiyê de dike, ku ew di van rêzên helbestê de kurteber dike û dixwaze bibêje destê Xalîd ji cwamêrî û qinciyêtiyê ewqas in ku nayene hejmar:

له أياد عليك ثابتة      اعد منها ولا اعددها

1 Ji ber emaneta zanistî û zehmetiya wergerandina helbestan me tenê hewl daye hinek caran wataya giştî ya helbestê bi kurtasî têkelî mijarê bikin.

Piştra Şêx Ebdurrehman El-Nehas, Neqîbu’ l Eşraf a Beyrûtê, helbestek xwend ku têda amaje bi wê çendê dabû Xalîd ew qas mezin e ku helbest û pexşan bi ferz dizanin pesna wî bidin ji ber ku welat vejandiye hukmeke heq û rastî ava kiriye bi corekê ku welat berve pêş çûye lewma di’ayê serkeftinê jê re dixwazin:

كذلك والينا المعظم خالد     من استوجب التمداح بالنظم والنثر
بمسعاه للاصلاح احيا بلادنا     وشيد حكم الحق بالنصح فى الامر
وما برحت تزهو البلاد بمجده     وتحسدها فى افقها بهجة البدر
فنسأل مولانا العظيم بقائه     وتوفيقه دوما الى الخير والبر

Helbestvan Faris Efendî, endamê Dadgeha Bazirganî ya Beyrûtê, dê bi helbestekê beşdar bibe ku tê de behsa malbata Baban û xandenî û camêriya wan dike û wiha dibêje:

فوالى عليه نعمة بعد نعمة     ولاسيما النعمى بواليه خالد
امير اذا استنسبته اعتز راجعا     الى سادة غر كرام اماجد
الى آل بابان الاولى دون قدرهم     مناط الثريا او منار الفراقد
هم الشم ارباب المفاخر والعلى     أباة سراة من اجل المحاتد
امام من الافراد فى الفضل والوفا     همام من الامجاد سامى المقاصد
اذا قال فالفعل المؤكد شاهد     على صدقة لامن يمين وشاهد

Ta digehîje:

وما المال والابدان الا امانة     من الله والسلطان فى كف خالد

Paşê helbestvan Mihemed Efendî el-Libabidî ku karmendekî wîlayeta Beyrûtê ye, helbesta jêrîn xwend:

مآثر ذى المجد المؤثل خالد     بجيد العلى منظومة كالقلائد
همام لقد نال الفخار بهمة     تناضل فى الافلاك هام الفراقد

Ta digehîje:

هم آل بابان الاولى اجتمعت بهم     صنوف المعالى من طريف وتالد
سرى له فى الناس حسن سريرة     تدل على سر الكرام الاماجد
فلا زالت الاوطان تشكر دائما     مآثر ذى المجد المؤثل خالد

Helbestvan Şêx Qasim Efendî Ebû’l Hesen el-Kestî hestên xwe wiha anî ziman:

احوذى من آل بابان عنهم     انبأتنا الشهامة الخالدية
عن لسان العموم اهدت اليه     واجب الشكر هيئة البلدية

Nivîskar Îzzetlu Îbrahîm Beg El-Eswedî bi pesindaneke bilind hestên xwe ji Xalid Beg re ji bo xizmetên wî yên ji bo bajarê wî anî ziman.

Waliyê Nablusê Mihemed Rifat Efendî piştî îfadekirina hestên xwe bi pexşan helbestek jî nivîsand ku têda hatiye:

خالد بگ وزير منصف     طالب من ربه خير المآب
كم افاض الخير فى نفع الورى     وبدا باللطف فى حال الخطاب

كم الى الاشراف اضحى مسعدا     ولمن للعلم حاز الانتساب

فلهذا القطر نادى قائلا     ربنا وفقه دوما للصواب

Helbestvan Îbrahîm Efendî Meczûb jî bi helbestekê beşdar bû, ku tê de wiha hatiye:

فلا يرحت ايامه فى مسرة     وايام والينا المعظم خالد

Helbestvan Selîm Efendî Nesrullah Ceddî jî hestên xwe wiha anî ziman:

فضله الخالد بحر فاذا     جاءه طالب نعمى لا يخيب

ولكم أبدى لنا ماثرة     نشرها افضل من نفحة طيب

Wate: nî'meta wî derya ye û dema ku kesek li pêy fedl û nî'meta wî biçe ew kes bêhêvî nabe, eve jî ji bo me karekî wisa ye ku baştir e bînîne ziman.

Şair Îbrahîm Efendî el-Huranî helbestek dirêj ji bo pesnê Xalid Beg dibêje ku tê da Xalîd Beg bi mezin, xwedî fedl, emînê xelîfe, wezîrê wî û gelek pesnê bilind dihesbîne. Bo nimûne:

وأيد دين الوالهين جمالها     كما ايد الاحكام بالعدل خالد

خليل العلى والمجد والفضل والندى     وما شاء من باقى الفضائل قاصد

امين امير المؤمنين وزيره     مدبر امر الخلق والله عاضد

حليف المعالى فخر بابان من بهم     تفاخرت الغر الكرام الاماجد

شموس الهدى والعلم والدين والتقى     لهم فى رحاب الخافقين مساجد

Piştre, helbestvan Mihemed Efendî Zeynedîn el-Lubnanî helbestek dixwîne, ku tê de wî dişibîne Xalîdê kurê Welîd û dibêje:

فتولاها وزير خالد     ذكره ذكرنا بابن الوليد

دام فى يمن المليك نائلا     لرضاه ظافرا بما يريد

Paşê Rexîb Efendî el-Bezrî, ku yek ji dadwerên Dadgeha Bazirganî ya Beyrûtê bû, gotarek tijî pesin xwend û carinan bi helbestekê dixemiland, ku yek ji wan ev e:

لخالد فى ولايتنا اياد     تخلد ذكره ضمن الدفاتر

فنحمده ونشكره جميعا     لما ابداه من حسن المآثر

Wate: li wîlayeta me de ew karên ku Xalîdî kirine di nav defterên dîrokê de dimînin. Ji ber hendê em tev spas û şukrê xwe jê re dikin li hember ew karên herî baş ku wî kirine.

Paşê ew helbesteke dirêj cuda dixwîne, ku tê de wiha îfada xwe dike:

ولى نعمتنا والى ولايتنا     كشاف كربتنا كهف لنا وخبا

من آل بابان اهل الفضل من شهدت     بفضلهم عقلاء الناس والادبا

بشراك بشراك يابيروت حيث اتا     ك خالد واليا فالخير قد قربا

ما همه غير توفيق العباد وعم     ران البلاد وتسهيل الذى صعبا

جاه الاماثل والاعيان عن ثقة     كهف الارامل والايتام والغربا

Paşê helbestvan Hannah Bak el-Esed helbesteke bi Tirkî û Erebî ji bo pesindana Xalid Beg nivîsand:

در فراست اسمی خالد قویدیلر ذکری خالد نسبتی ابن الولید

لطف خالد ذکرنی تخلید ایدوب فخر عالم اولدی بالرأی السدید

سموه خالد قد جادت فراستهم فخلدت طیب ذکراه معاطره

Hêjayî gotinê ye ku ev pirtûk hemû name, helbest û raporên şeva şahiyê dihewîne. Ji aliyê Xelîl Sarkis û Mihemed Bedran ve hatiye amadekirin û di serdema Osmaniyan de li Beyrûtê hatiye weşandin. Bi qasî ku em dizanin, ev pirtûk û belgeyên li ser Xalid Beg cara yekem bi zimanê Kurdî têne belavkirin û bê guman analîzkirin û berhevkirina hemî agahiyên li ser wî dê bibe beşek girîng a dîroka yek ji kurên mîrekî Baban û karbidestekî mezin ê Osmanî. Herwiha, hin ji zarok û neviyên padîşahên Baban, piştî windabûna desthilatdariya wan li Silêmaniyê, koçberî bajar û welatan bûn û hin ji wan wek ar di nav sitriyan de belav bûn û di dawiyê de lêgerîna wan beşek ji nivîsandina dîroka jibîrkirî ya Kurdan e.

## Encam

Xelîl Xalid Beg yek ji kurên Ehmed Paşayê Baban bû. Piştî nemana mîrektiya Babanan, malbata wî koçî Edeneyê û Stenbolê kir. Bavê wî, Ehmed Paşayê Baban, waliyê çend wîlayetên dewleta Osmanî bû. Kurê wî Xelîl Beg rêka bavê xwe şopand û gelek postên îdarî girt, ya herî berbiçav jî waliyê Beyrûtê bû. Ya balkêş ew e navborî li Silêmaniyê ji dayik bûye û li Bexdayê xwendiye û piştra çûye Stenbolê. Ev sê dever bingeha roşinbîriya wî xurttir dikin û piştra weke wergêr, mamoste û serkatibê balyozxaneyan li axa Osmaniyan û Îranê de kar dike û di wan karan de rolê giring digerîne û bi vî sebebê çend caran tê xelat kirin. Ya girîng ew e ku pirtûkek taybet bi zimanê Erebî li ser wî hatiye nivîsandin û di serdema Osmaniyan hatiye çapkirin, ku tê de bi dehan pexşan û helbestên Erebî ji bo pesnê wî hatine çêkirin. Ev cara yekem e kurdek ku rayedarekî mezin ê Osmanî bû, ji aliyê helbestvan û rewşenbîrên Ereb ve tê pesinandin. Dema xwîner li wan helbestan mêze dike dibîne ku bi rewanbêjiyeke pir bihêz hatine honandin û nîşana wê çendê ye ku kesayetiyeka kurd bûye kereste û mijara helbest û pexşanên bihêz di nav edebiyata erebî de. Her çend piştî hilweşîna mîrektiya Babanan derbarê vê malbatê de gelek kêm agahî hebin jî, bi rêya arşîvên Osmanî agahiyên nû derbarê vê malbatê de wê werin keşifkirin.

## Jêder

Temizer & Serbestoğlu, Abidin-Ibrahim (2019), *Babanzâde Halil Halid Bey ve Belgrad Sefirliği*, 2 nd Erasmus International Academic Research Symposium,October 11-13 2019Paris/France.s285-289.

Cerîdeya Lisanul-hal, (1894). *Ettehanî elbelediye fîl-Mehamîl-xalidiye*, Etteb’etul-Belediye . Beyrut.

B.O.A. A.}MKT.NZD.00046.00001.001

B.O.A. BEO.003568.267531.002

B.O.A. DH.SAİDd..00002

B.O.A. DH.ŞFR.00178.00034.001

B.O.A. MV.00098-2


B.O.A. ŞD.00096.00034.001

B.O.A. ŞD.01002.00064.002

B.O.A. Y..PRK.ML.00022.00083.001

## Pêvekê Belgenameyan


**Pêvek 1: wêneya Xalid Beg**





Babanzade Halil Halid Bey


## Pevek 2: Nimûneya hinek Belgenameyên Osmanî

T.C. BASBAKANLIK OSMANLI ARSIVI DAIRE BASKANLIGI (BOA)



DH.SAİDd.00002






T.C. BAŞBAKANLIK OSMANLI ARŞİVİ DAİRE BAŞKANLIĞI (BOA)

معروض چاکر کمینه لریدر

OSMANLI ARŞİVİ
BEO
3568 | 267531 | 2

BEO.003568.267531.002

**Pevek 3: wêneya bergê pirtûkê**



al-Tahani al-baladiyah

التهاني البلدية

في

المحامد الخالدية

مجموعة اقوال الجرائد في وصف احتفال مجلس بلدية بيروت لحضرة
صاحب العطوفة

خليل خالد بك أفندي

والي ولاية بيروت الجليلة

والخطب والقصائد التي تليت في ذلك الاحتفال

جمعتها ادارة جريدة لسان الحال تذكارًا لمساعي
عطوفة ملجاء الولاية

المطبعة الادبية بيروت سنة ١٨٩٤

Digitized by Google
Original from
UNIVERSITY OF MICHIGAN